Êzimk

Şehyan

Salih Xazî

Berî heyamekê, ez li gel hevalekî li tirafîklayêta senterê bajêrî li hêviya gilopa kesk bûm. Ji nişka ve karwanekî tirombîlan bihurîn û qelebalix ji layê dî yê cadê derbaz bûn. Dengê stiran û tilîliyan ew dewir ber maliq kirin. Hevalê li rex min bi kenî ve gotî: ''*eve yekê dî jî mala xwe xirab kir!*'' Min jî bi sersormanî ve bersiva wî bi girnijî da bo çi?!:

- eve dawete û dibe zavayî ji nû serê wî kete ber pêlên dijwarên vê jiyanê. Eve jiyana ku gelek kesên mîna min tehemila wê nebe.

Bi rastî mirov axiftina vî hevalî hûrik şirove bike ta radeyekî wesaye ji ber ku li piraniya welatên pêşkeftî berî ku kesek jinê bihîne, divê cara yekem ew xwe serbixwe be. Ango divê ew berî her tiştî hizra maleka serbixwe bike. Xaniyek hebe û yekser jiyana xwe ya nû di wî xaniyê nû de dest pê dike, lê di nav civakê me yê kurdewarî de hêşta ev rêbaze ya kûviye û cihgîr nebûye ji ber çend egeran ku ya ji hemûyan zîqtir arîşa aboriye. Lê heger kesekî jin îna û di nav mala babê xwe de ma, dibe hindek arîşe rû bidin. Nemaze yên civakî ji ber ku li wê malê çend kesekên din jî hene, ango ew dê girêdayî be û neşên serbixweya xwe ya xêzanê bi dest ve bihînin. Lewra di nav wê qelebalixê de nexweşî peyda dibin. Û di encam de dê her binêre cihekê dî ji nû ve dê kirêdarî dest pê bike. Xwazî her di jiyê gencatiyaka berwext de her kesekî hizra paşerojê xwe kiriba û hukûmet jî ji dil alîkar ba bi vî çendê da hindek arîşên civakî bihêne çareserkirin.